# Têbînî:

# Jehrîbûna bi Kuvarkê



## Nexweşiyên ku gefê li Jiyanê dixwen
## Ji ber xwarina Kuvarikên Amanîta

Kesên tûşbûyî bi nexweşiyên bi xwarina Kuvarkê ku gefê li jiyanê dixwen, hertim divê bên dermankirin. Sedema vê yekê ev e ku li Almanê gellek kuvarkên jehrî hene ku gellek dişibin kuvarkên xwarinê li deverên din ên cîhanê.

Dûhata vê pirsgirêkê ev e ji ber nebûna ragihandinê, kuvarkên jehrî weke Kuvarka pirr bi xeter a Amanîtayê jî tên berhevkirin. Ji ber wê yekê ku vê Kuvarkê tehmeke xerab tine û yekem nîşaneyên nexweşiyê piştî çend demjimêran xûya dibin, xetereke pirr bitalûke ye.

**Loma ev şîret girîng in:**

- Eger kuvarkên şînbûyî li vir baş nas nakin, kuvarkên Bejî berhev nekin.
- Kuvarkên ku hûn li deverên din ên cîhanê wek kuvarkên xwarinî yên xweştam nas dikin renge mînakên wan li vir jehrî û kujer bin.
- Eger piştî xwarina wadeya xwarinê ya ku têda kuvark heye, tûşî dilêşên weke Spasmê bûn an dilê we rabû û bi izhalê ketin, Ji Kerema Xwe bilez xwe bigihînin nexweşxaneyê. Ji bîr nekin ku bermayiyên kuvarkan an wadeya xwarinî ya têda kuvark an vereşiyana we heye bi xwe ra bibin. Ev kar diyarkirina cûreya jehrîbûnê hêsan dike.
- Ji Kerema Xwe van zanyariyan veguhezînin xizm û nêzikên xwe jî. Hûn ê bi vî karî renge jiyana kesekî/ê bifilitînin!
- Giftinformationszentrum Nord: 0551 - 19240

GIZ nord Giftinformationszentrum-Nord

Medizinische Hochschule Hannover

Niedersächsisches Ministerium für Soziales, Gesundheit und Gleichstellung